# FERMANA PARASTINA JI ÊRÎŞA CINSÎ

Mexdûreke êrîşa cinsî dikare ji dadgehê fermana parastina ji êrîşa cinsî (SARO) bixwaze.

Êrîşa cinsî tê wateya têkiliya cinsî ya bêyî razîbûnê. Ango têkiliyeke yan jî tevgereke bêyî daxwazê ya ku mexdûr razî nebûye yan jî nekariye razî bibe.

Dê û bav, zirbav û jinbav,yan jî parêzvanên keseke/î temenbiçûk ku difikirin zarok rastî destdirêjiya cinsî hatiye, dikarin daxwaza SARO'yê bikin.  SARO ji Bersivdêr re dibêje ku kesa/ê mexdûr tacîz neke, neşopîne û gefan lê nexwe. SARO her wisa li Bersivdêr qedexe dike ku bi kesa/ê mexdûr re têkiliyê dayne yan jî here mal, dibistan yan jî kargeha wê/wî.

Ji mexdûra/ê ku daxwaza SARO dike re Daxwazkar yan jî Aliyê Parastî tê gotin. Kesa/ê ku SARO li dijî wê/wî ye Bersivdêr yan jî Aliyê Astengkirî tê gotin.

Heke Dadgeh tesbît bike ku Daxwazkar ji bo pêbaweriya îdiaya êrîşa cinsî mercên maqûl nîşan dide, dadgeh dikare SARO'yeke demkî ragihîne. Ev SARO'ya demkî dikare bêyî agahdarkirina aliyê hember bê derxistin.

SARO'ya demkî heta ku biryar ji aliyê dadgehê ve bê redkirin yan jî SARO'yeke mayînde têkeve meriyetê, di meriyetê de dimîne. Wateya "Hat teblîxkirin" ev e ku temenmezineke/î ne beşeke dozê ye, bi gelemperî cîgirê Şerîf, kopiyeke ji serlêdanê û agahdariya danişînê dide Bersivdêr. Bersivdêr dê ji SARO'ya demkî bê agahdarkirin û derbarê dem û ciyê danişîna SARO'ya mayînde de bê agahdarkirin.

Heta ku hemû bi nivîskî qebûl nekin ku dema danişînê ji 14 rojan derengtir bigirin, danişîn dê di nav 14 rojan piştî derketina SARO'ya demkî de pêk bê.   Heke sedemeke mafdar bê nîşandan, dadgeh dikare danişînê ji 14 rojan derengtir pêk bîne.

Ji bo dayîna SARO'yeke mayînde divê Daxwazkar nîşanş dadgehê bide ku bingehên maqûl hene ku dadgeh bawer bike êrîşa cinsî ji aliyê Bersivdêr ve hatiye kirin.  Ev bi heman awayî ji bo dayîna SARO'ya demkî jî tê sepandin. Heke SARO'ya mayînde ji aliyê dadgehê ve bê dayîn, ev dikare ji bo du salan yan jî demeke kintir derbasdar be.

[North Dakota Century Code Section 12.1-31-01.2]

[Legal Self Help Form]



North Dakota Domestic & Sexual Violence Coalition

Projeyeke ji aliyê NDDSVC ve ji bo we hatiye pêşkêşkirin - Gulan 2020